



**Vekişandina hêzên Amerîkî ji Sûriyê, îxanetek e li Kurdan û derfetek e ...**

»»» R:8



**Ez ne kêmendamiyê, belku ez...**

»»» R:6

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdî](http://www.kurdistanmedia.com/kurdî)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (340)21-12-2018 Buha (1000) Tûmen



**Hêza Pêşmerge, hewcehiya bizavê û waneyek ji bo xebatê**

»»» R:7

## Gel û Pêşmerge, çiya û bajar in

**R**êûresma taybet bi 26-ê Sermawezê, roja Pêşmerge Kurdistanê, li çiyayên Kurdistanê de bi amadebûna fermanî giştî yê Hêza Pêşmerge û komek ji fermanîyên Hêza Pêşmerge bi rê ve çû.

Li gor nûçeya ku gihîştî ye malpera "Kurdistanmedia"yê, roja Şemiyê rêkefta 24-ê Sermawezê 1397'an a Rojî, rêûresmeke taybet bi roja Pêşmerge Kurdistanê ji aliyê fermanîyê Hêza Pêşmerge ve li çiyayên Kurdistanê bi rê ve çû.

Di destpêkê de rêûresm bi xwandina sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" ji aliyê Hêza Pêşmerge ve dest pê kir, û piştî deqeyek bêdengî bo rêzgirtinê ji canê paqije şehîdên Kurd û Kurdistanê hate ragirtin.

Piştî wergirtina "san" a

fermanîyê Hêza Pêşmerge li hêzên amadebûyî di rêûresmê de, rêjeya destê û hêzên Pêşmerge ku nîşanderê ew qasê amadehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê bû bi rê ve çû.

Di beşa yekem a rêûresmê de rêzdar

"Kawe Behramî" Fermanîyê Hêza Pêşmerge çend gotinek pêşkeşî amadebûyên rêûresmê kir. Navbirî di gotinên xwe de îşare bi vê yekê kir ku, roja 26-ê Sermawezê roja Pêşmerge Kurdistanê, roja bîranî û îşarekirina bi taybetmendiyên Pêşmerge, û roja rêzgirtinê ji fedakarî û cangorîkirina xortên têkoşer û xebatkarên netewa me ye, û roja wan xortên şoreşger û cangorî ye ku sengerên xwe li dijî dîktatorî û serberedayiya rejîma kindir û sêdara rejîmê di rewşên zehmet de parast, ew qehremanane bûn ku têgeha guherînkariyê û Rasanê



kirine xetîra Rasana nû.

Derheq bi rewşa nihaya Îranê jî got: Rejîma Komara Îslamî li rewşa niha de di warên abûrî, civakî, siyasî û herwisa navxweyî de, di rewşeke gelek nebaş û bêserûber de ye, û di nav civaka cîhanî de tu cure hitbarek nemaye, herwisa bi sedema kiryarên terorîstî û destêwerdanê di nava karûbarê welatên cîhanê û bixasimanî di Rojhelata Navîn de wekî bînpêkarê mafê mirovan di nav civaka navneteweyî de hatiye naskirin, û hemû kok û bîngeha aramiya wî welatî sist û lawaz bûne, û êdî tenê hewcehiyê bi vî yekê heye ku hemû alî pêkve teba bin û palekê lêdin, da ku biherife.

Di beşeke dina qisên xwe de rêzdar Behramî rû li xelkê Kurdistanê û endam û alîgirên Hizbê got: Em daxwaz ji hemû dilsozên gelê Kurd bi xasimanî wan kadr û pêşmergeyan şoreşger ku bi salan di rêza xebatê de bo azadiya Kurdistanê eş û zehmet kêşane û niha bi her sedemekê be li derveyê welatê cêhgir bûne dikin, ku bi her awayekî ku bikarin alîkarî û piştevanî me bin, û daxwaz ji endam û alîgirên Hizba Demokrat li derve û navxweyî Kurdistanê dikin, ku bi her awayekî ku dikarin piştevanî Hêza Pêşmerge Kurdistanê bin. Piştî qisên rêzdar Kawe Behramî rêzgirtinname wekî deba salane bi ser çend pêşmergeyên mêjîn ên Hizbê de hatin dabêş kirin, ku heyamî 20 salan e ku

»»» R:2

**Sergotar****Avakirina  
nîştimanekê****N: Kerîm Perwîzî**

Kurdistana Rojhilat wekî erdnîgariyeke cihê akincîbûnê, renga di warê xwezayî de, hindêk cudahî digel navçeyên derdora xwe de hebe. Di vî warî de, û di warê erdnîgarî de, Kurdistan cihekî çiyayî ye ku li deştayî û xakên kewîr ên nawerasta Îranê û cihên farsnişîn cuda dike. Yan di warê asta baranbarîn û çavkaniya avê û hindêk parametrên din, Kurdistanê taybetmendiyek hebe ku wekî hêleke erdnîgarî digel derdorê cudahiyan diyarî bike. Lê eva ku cihekî erdnîgarî bo akinciyên wir dike nîştiman, paramêtrên erdnîgarî nînin.

Bi gotineke din nîştiman pênaseyeke hizrî û şewedîtingehêk e ku tiştên xwezayî di nava mêjî û xewnên mirovan cuda dike. Bona rohnûna zêdetir hewce ye ku em bêjin cudahiya di navbera xwezaya erdnîgarî û nîştimanî, wekî cudahiya di navbera xalî û kevir, digel malê de ye. Xalî û kevirên ku li ser hev hatibin danîn û dîwar û serban û ode jê hatibin çêkirin, û malbatek tê de bibin xwedîmal, û tê de vehewin, wê demê pênaseya malê werdigre. Kurdistana Rojhilat bo Kurd û akinciyên wê cihê jiyane ye, û tê de jiyana xwe derbaz dikin. Lê deshîlata xakê û şewaza jiyane û biryar li ser pêşeroja welat û civakê

»»» R:Doma Manşêtê

bi bê veqetiyên li rêza berxwedanê de ne. Ew kesên ku îsal rêzgirtinname bi ser wan de hate dabeşkirin ewane bûn: Heval "Siyamend Terbî, Yasîn Yusifî, Omîd Mendumî, û Şehab `Eskerî". Piştî wekî deb û resma salane serkevtiyên Hêza Pêşmergê Kurdistanê, ku festîvala îsal ku bi xwe duyem festîval di qonaxa Rasana Rojhelat de bû, ji aliyê beşek ji fermandeyên Hêza Pêşmerge ve hatin xelatkirin. Di çend beşên cuda de Pêşmergên Kurdistanê bi xwandina sirûd û stran û helbestan rêûresm xemilandin, û dawî beşa rêûresmê jî pêk hatibû ji encamdan û nîşandana çend manorên nizamî ên balkêş ji aliyê desteyek ji Pêşmergan ve. Ew rêûresma bi davet û dîlana beşdarbûyîyên di rewşekî tewaw pêşmergane de dawî pê hat.

Herwisa Reûresmeke bicoş ji bo rêzgirtin ji xebat û tekoşîna Hêza Pêşmergê Kurdistanê li binkeya Cêjnîkanê ya PDKÎ de bi rê ve çû.

Li gor nûçeyê ku gihîştîye malpera "Kurdistanmedia"yê, roja Sêşemiyê rêkefta 27'ê Sermaweza 1397'an bi beşdariya beşek ji endamên rêberî yên Hizba Demokrat, kadr û Pêşmerge û malbatên wan li kempa Cêjnîkanê, rêûresmekî bicoş taybet bi 26'ê Sermawezê bi rê ve çû. Rêûresm bi xwendina sirûda neteweyî ya Ey Reqîb û ragirtina deqeyekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqije şehîdan dest pê kir.

Piştî rêzdar "Teymûr Mistefayî" Endamê Navenda Siyasî a Hizba Demokrat a Kurdistan a Îranê bi wê boneyê ve çend gotinek pêşkeş kir. Navbirî di axavtina xwe de bas ji vê kir ku "Pêşmerge hêza çekdar a

gel e, lê hêzek e ku karê wê tenê çekhilgirtin û şerkirin û kuştin nine, belku çekdarek e ku dizane çek hilgirtiye bona vê ku di pêxema armancekê de ku bidestxistina demokrasî û azadiya neteweyî ye, ji bo gelê xwe xebat dike, ew dizane û bi başî tê gehîştîye ku gelê wê hatiye çewsandin, zulm lê hatiye kirin û haşa ji bûna wê tê kirin, rê ji pêşkeftina wê tê girtin û di yek kelimê de kerameta wê tê lekedarkirin. Pêşmerge dizane ew gela bi şiyana xwe û bi qehremanetî û fidakariya xortên biwec ên wî nebe, qet nagîje azadiyê, û di wê têgehîştinê de ku ezîztirîn kesên xwe wate malbata xwe bi cî dihêlin û bo xebat li pêxema azadiya gelê xwe de rû li rêza pêşmergatiyê dikin, ew dizanin pêşmergatî anî desthilgirtin ji hemû xweşiyên jiyane û xwe bextkirin li pêxema gelê xwe de, û di rastî de ew rêya bi agahî ve hîlbijartîye, her ji ber wê yekê ye

»»» R:3

bi destê wî xelkî bixwe niye, ku tê de dijîn.

Di rastî de wekî mirovekê ku di nava cihekî erdnîgarî de dijîn, ku biryardana li ser wê, di destên deshîlateke sepanî ya stemkar de ye. Gelo jiyana di cihekî de, ku biryara çarenûsa cihekî ye, û çawanîya jiyana û manê di destê te bixwe de nebe, jiyaneke asûde û cihê xatircemiyê ye?

Bona vê ku xelkê Kurdistana Rojhilat di cihê jiyana xwe de hest bi xwedîmalîtiyê bikin, û xatircem bin, û xatircem bin ji pêşeroja jiyana xwe, û nivşên xwe, û dibe biryar li ser mala xwe û jiyana nav vê malê û îdarekirina mal û jiyane di destên wan xwe de be. Di çarçoveya wê xalî û kevir de jiyankirina ku ne şewaza malê û odeyên wê, û ne jî şewaza jiyankirin û çawanîya mifahwergirtina ji odeyên mala te, bi destên te nebin, nabêjnê mal, belku kempeke karê bîzorî ye, ku deshîlatdarên serekî li behreya jiyane û karê te dixwin, û tu jî koleyeke bê pêşeroj î, di bin piyên zordarên stemkar de. Gelo jiyankirin di nava erdnîgariyekê de, ku hemû deb û resm û yasa û rêsayên sepanî bin, pênaseya jiyana azad û mirovane werdigre?

Rasana Rojhelat îradeyeke hilkeliyê nava dilê civatên xelkê Kurdistanê ye ku dixwazin Kurdistanê bikin vê nîştimana ku xwe pênase dikin, û bixwe jiyana xwe ya tê de diyarî dikin, û di rastî de dikin malek bona veweviyan û vegeşîna jiyana xwe, û nivşên pêşeroja xwe.

Avakirina nîştimanekê gelo tenê bi yek girûp û yek hêza siyasî tê kirin, yan hewce ye ku hemû civak bi hemû girûpên siyasî û hemû tex û qat li dubare bingehdanîna nîştimanê de beşdar bin? Rasana Rojhilat girêdana xebata çiya û bajar e, da ku hem çiya û hem bajar pêkve, wî cihê jiyane bikin, ku nîştimana pêkvejiyan û asûdeyî û pêşeroja azad û geşkerî û dadperwerane be.

## Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê daxuyaniyek ji bo raya giştî belav kir

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê daxuyaniyek ji bo raya giştî belav kir

Kurdistanmedia: Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê derbarê vekîşîna Sazmana Xebat ji vê navendê, daxuyaniyek ji bo raya giştî belav kir.

Daxuyanî wiha ye;

Agehdayîyek ji aliyê Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê Ji bo raya giştî

Welatîyên hêja û alîgirên hevrêzî û hevgerîyên!

Hûn haydar in ku salekê beriya niha, piştî hewlên ciddî ên pîrîniya partiyên Kurdistanê û ji bo bersivdana xwestekên we ên hêja ji bo hevkarî û hevrêziya di navbera partiyên Kurdistanê Îranê de, Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê hate avakirin.

Piştî ji bo jîhevfermîkirinê û ji bo hevdengîya zêdetir, pêwîst bû Navend, hêlên giştî û pîrensîpên xwe ji bo dabînkirina armancên xwe, ji bo raya giştî û xelkê eşkere bike. Di vê derbarê de hin mijar ji aliyê nûnerên partiyên ve di bin navê hêlên giştî de hatibûn amadekirin û piştî lihevguhertina nerînên aliyên beşdar di Navendê de û nirxandina mijarê, hêlên giştî amadeyî pejirandîndê bûn. Lê ji ber ku tenê Sazmana Xebat a Kurdistanê Îranê bi

hin xalên hêla giştî re hevdeng nebû, Navenda Hevkariyê ji bo parastina hevrêziya di navbera aliyên beşdar de û bi armanca rêzgirtin ji nerînên Sazmana Xebat û dayîna derfeta zêdetir bo wan çendîn mehan, ragihandin û belavkirina hêlên giştî ên Navendê paş xistin.

Lê mixabin di demekê de ku endamên Navendê, roja 19'ê Sermaweza 1397'an a Rojî li benda beşdariya vî sazmanê di dehemîn civîna Navendê de bûn, lê ew tevlî vî civînê nebûn ku taybet bû bi standîna biryara dawiyê li ser belavkirina hêlên giştî.

Piştî ku ew tevlî civînê nebûn, şandeyek ji endamên Navendê



ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران  
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.  
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

çûne serdana vî sazmanê, lê belê ev serlêdan jî bêbandor bû û Sazmana Xebat li ser gotinên xwe rijd bû û digot nabe peyva Federalîzmê ji bo rêveberiya sîstema pêşerojê a Îranê bibe armanca Navendê.

Heyamekê jî li ser mijara sêkolarîzm û gotûbêjan weke pîrensîpa xebata siyasî a Navenda Hevkariyê hevnerîn nebûn û mixabin Sazmana Xebat, piştî serdana şandeya Navendê, di daxuyaniyekê de û piştî re jî di konferansê çapemeniyê de yekalî axivî.

»»» Dom R:4

»»» Doma R:2

ku cihê hemû rêzêgirtinekê ne.

Di beşeke din a qisên xwe de ji bilî tekezîkirin li ser rewşa sepandî bi ser Kurdistanê û rewşa siyasî ya Îran û Kurdistanê de got: “Îran di sala 1397'an de di gel çend kêşeyên û kirîzan ber bi rû ye ku pênc ji wan kirîzane wekî “Eber Çaliş” wate kirîzên kûr tê naskirin, ku bi gotina aliyê fermî yê hikumetê ew kirîzane ev in: Kirîza avê, kirîza jîngehê, kirîza bêkariyê, kirîza sîstema bankî, kirîza sinduqa xanenişînî.

Digel hebûna wan kirîzane, hekî em dorpeçên Amerîka lê zêde bikin ku roja bi rojê berfirehtir dibin, û wan dewletane jî ku peyman dabûne Îranê ku di dewrlêdana wan kirîzane de alîkariya Îranê bikin, ji bilî qise nebe çî ji destê wan nahê, heta hekî karek jî ji destê wan bihê, heta niha bi kiryar çî nekirine.

Piştî axavtina Kak Teymûr Mistefayî, sirûdek li jêr navê Pêşmerge ji aliyê hunermend Xulam Fatihî ve hate pêşkeşkirin, piştî peyama hevpar ya Yekîtiya Lawan, Jinan û Xwendekaran a Hizba

Demokrata Kurdistan a Îranê ji aliyê Sekrterê Giştî yê Yekîtiya Lawan rêzdar Omer Fexredîner ve hat xwendin. Çend parçe helbestên şoreşgêrane ji aliyê helbestvan “Mamosta Bêbeş” ve xemilandina beşeke din a rêûresmê bû, û di beşa dawiyê de peyama teji ji hest û hemaseya xebatkarê mêjîn ê gel Mamosta Mela Hesên Şîweselî ku taybet ji bo wê rêûresmê hatibû hinarîtin, bi dengê wê bo amadebûyan hate belavkirin. Piştî peşaneke Mamosta Şerîf Felah ji aliyê Xatû Mêhreban Dêhقان ve hate xewandin. Beşek din ji rêûresmê pêk hatibû ji sirûdeke şoreşgêrane

bi navê “Kurdistan” ku ji aliyê hunermendê pêşmerge “Nîzam Secadî” ve hat pêşkeşkirin. Dawî beşa wê rêûresmê bi govend û dîlana beşdarbûyan dawî pê hat.

Her di vî derheqê de li pîrîniya gund û bajarên Rojhilata Kurdistanê endam û alîgirên PDKÎ bi awayên berfireh kar û çalakiya teblîxî bi rê ve birin û rêz ji roja pêşmerge girtin.

Li dervey welat jî li gellek bajarên Ewropayî rêz ji vî roja pîroz hate girtin û xebat û tekoşîna pêşmerge bilind hate ragirtin.

## Pêşmerge ji gel re karîzma ye



Perî Reşîdîyan

Dema ku navê pîroz û xweşê pêşmerge tê gotin, yekser mirov diçe wê demê, ku cara yekemîn pêmerge ji nêz ve dîtine, yan jî ji bo cara yekê guh li wî navî bûye.

Temenê min hema 8 an 9 salî bû. Ez digel kesûkaran çûme gundê ku ez lê hatime dinê. Gundê min jî wekî hemû gundên din ên Kurdistanê pir xweş e. Ez digel hindêk keç û xortên gund mijûlî lîstikan bûm. Ji nişkêve reng û rûyên gund guherî. Denge-dengek pir xewş kete nava gund de. Hindêk kesan dikire hawar û çepik lê didan. Hindêk kes şaş mabûn. Hindêk kes dibezîyan. Ez jî ketme pey wan. Min dît hindêk gundiyan bi dilekî pir bihest, hindêk mirovên ku bi çek û rextan bejna xwe xemilandine, himbêz kirine. Halê van dipirsîn. Hema min guh lê bû ku gundiyan gotin hûn xêr hatine "Pêşmerge". Min baz da, û çûme mal û min got: "Werin, werin, Pêşmerge hatine". Hindêk kes pişt serê min bûn, ewan digot: Renê cara yekê ye ku Pêşmergeyan dibîne, taze êdî yê heroj sera me bide.

Ev bîrewerîya ji bo min, û hemû kesên ku Pêşmerge ji nêz ve ji bo cara yekê dîtine taybetmendîya xwe heye.

Gelo çî dibe sebeb ku mirov ev hinde heyrana dîtina Pêşmerge dibe. Karîzmabûn wan kesan yan rêxistinên digre xwe, ku bikaribin bandora erênî li ser mirovan danên, û mirov li bêhêvîtiyê derxînin.

Pêşmerge ew kese ye ku can, mal, û rehetîya xwe dixwe xizmeta gelê xwe de. Cilûbergên Pêşmerge wek sembola neteweyî di nav gel de

diyar e. Pêşmerge ew şîyan heye ku dema li nav civakê de ye guhdariya gel dike, ji halê wan dipirse, xelkê rênimayi dike. Wan hişyar dike ku nekevne telika dujmin de. Civak û gel bi xwe bawer dibin û xwedî li xwe derdikevin. Ew yek hemû karakter in, û karîzmabûna Pêşmerge ne.

Hemû netewên dinê hindêk nîrx hene ku mirov nikare çî behayek, û qîmetekê bo wan destnîşan bike, ji ber ku nîrxên netewî ne.

Rojhelatê Kurdistanê ew şanaziya heye, ku eva serê 75 salan e, ku xwedî Pêşmerge ye. Gelê Kurd li Rojhelatê Kurdistanê pir bi şans e ku xwediyê wî nîrxî ye. Navê pîroze pêşmerge ji bo cara yekê di nava PDKÎ de hate bikaranîn. Di dirêjahiya dîroka xebata xwe de pêşmerge PDKÎ hertim li gel xwedî derketine û derdikevin jî.

Ji ber hindêk zirûfan ku pêwîst nake ez li wir bas bikim, pêşmerge çend salan ji gelê xwe kêma ya zêde dîr ket. Helbet ew pêwendîya tu car sedî-sed qut nebû, lê weku caran gelê Rojhelat zû-zû Pêşmerge xwe ji nêz ve nedidîtîna ku ew hesret û xem di nava dilê wan de roj bi roj zêdetir dibû.

PDKÎ di nava gel de rabûye û êş û elemên wî gelî baş fêm dike. Dema ku biryara Rabûnê (Rasan) li Newroza 2015'an de hate dan, ew biryara tam di dema xwe de bû. Ji ber ku gel carek din bû xwedî hêvî. Ew biryara bicî û pêwîst bû, ji ber ku Komara Îslamî ya hov wisa hizir dikir ku xebata PDKÎ ji nav çûye, û ew yê gelê Kurd li gorî berjewendiyên xwe bi kar bîne.

Newroza 2018'an gelê Kurd bi axabanî û cilûbergên xwe nîşan dan ku ew bi pêşmerge re ne. Refên keç û xortên gund û bajarên Rojhelata Kurdistanê li dora agirê Newrozê ku sirûd û stranên şoreşgêrî bi hev re bi dengê çiyayî dixwînin, û vê yekê diselimînin ku em jî pêşmerge ne.

Neyar dizane ku nikare gel û pêşmerge li hevdu cuda bike, ji ber ku pêşmerge gel e, û gel jî pêşmerge ye.

Her li ber wan sebebane Komara Îslamî ya hov îsal li 7'ê Îlonê binkeyên Hizba Demokrat kirin

armanc, û çendîn pêşmerge û kesên sivîl şehîd û birîndar kirin.

Rijîma hov xwest hem zerbê li hêz û pêşmerge Demokrat bide, û hem jî gel bitirsîne, û herwisa dixwest ku hestên gel birîndar bike, jiber ku dizane pêşmerge di nava dilê wî gelî de rabûye. Li gelê netirs û xwedî bawer ê Rojhelatê Kurdistanê di roja 12'ê Îlonê yanî piştî pênc rojan bi hewara pêşmerge xwe de hat, û bi gireva giştî mistek tund li ser devê rijîmê da, û rejîm û gelên din ên Îranê şaşmayî kirin.

Di van salên borî de çend caran pêşmerge çûne nav gel de. Dema ku ew dîmenane li ser torên civakî belav dibûn, mirov tûşî heyecanê dibû. Refên keç û kurên pêşmerge bi hev re hêvî û hêzê dide mirov.

Di wan dîmenan de pir êşkere ye ku gel her wekî salên berê tîniyê dîtina pêşmerge ye. Mirov keyfxweşî û hesreta dîtina pêşmergeyan li nava çav û rondikên wan de dibîne. Gel bi dilekî pir evîndarî wan himbêz dike. Pêşmerge xwedî karîzmayek waye ku mirov li dîtina wan têr nabe.

Bi vê hêviyê ku PDKÎ zêdetir ji caran xwe birêxistin bike, û yekîtiyek hêj xurtir di navbera hêzên Rojhelat de çê bibe. Heyfa gelê Rojhelatê Kurdistanê ye, û bila hinde di bin zulm û stema şovênîstan de nebe. Erka gel e jî, ku zêdetir ji caran xwedî li xwe û pêşmerge xwe derkeve. Gel û pêşmerge bi hev re dikarin çarenûsa Rêjhelatê Kurdistanê diyarî bikin. 26'ê Sermawezê ew roja pîroz li Pêşmerge û gel pîroz be

### »»» Dom R:3

Emê li vir weke Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê, rastiya mijarê ji we re vebêjin.

1. Sazmana Xebat a Kurdistanana Îranê di daxuyaniya xwe de behsa bînpêkirina lihevkerîna dîke û yekalî, Navenda Hevkariyê weke hîloşayî binav dike. Lê ev gotin, tam ji rastiyê dîr in û Navend jî di karên xwe de berdewam e.

2. Her çar aliyên din ên Navendê, ji bilî Sazmana Xebat, li ser Federalîzmê ji bo pêşeroja Îranê rijd û hevnerîna in. Lê belê di vê derbarê de Sazmana Xebat ti pêşniyareke baştir ji federalîzmê tine bû. Rijdbûna wan li ser nerîna wan di karên rêxistinî ên hevpar de, ji pîrensîpên demokratîk dîr in.

3. Tevî ku Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê, nemana Komara Îslamî

weke baştirîn bijarde dibîne û piştrast e ku ti caran bi rengekî ciddî bawerîya Komara Îslamî bi gotûbêjê ji bo çareserîya pîrsa Kurd li Îranê tine bûye, lê Navend ji bo dabînkirina mafên xelkê Kurdistanê gotûbêjê, weke pîrensîp di karên siyasî de dibîne û danûstandinê red nake.

Di dawiyê de pêwîst e bê gotin ku Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê, tevî biryara yekalî a Sazmana Xebat a ji bo vekîşîn ji Navendê, dîsa jî tekezê li ser berfirekirina Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê dike û wê di vê derbarê de jî di kar û tekoşîna xwe de berdewam be.

**Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê**

**27'ê Sermawezê a 1397'an a Rojî**

## Elî Mir



N: Bûbê Eser

Di qawûşa ez bi xwe lê bûm. Rojekê me dît ku leşkeran ango Gardiyanan kesekî nîv mirî avêtin hundir qawûşa me û Gardiyanê qawûşa me ango zebeniye ber deriyê me bangî berpirsê qawûşê ê girtî kir û got:

-Berpîrs!

-Emir bike Komûtanê min.

-Vî bênamûs û bê şerefê ku bi tirkî nizane. Divê tu ango hûn wî di sê rojan de fêrî tirkî bikin.

-Tu emir bike Komûtanê min. Ji xwe leşkeran ango zebeniye ber deriyê qawûşan jî dizanî bûn ku kesek nikare sê rojan fêr tirkî bibin. Derdê wan ew bû ku piştî sê rojan ew li me tevan bidin, êşkence bikin û çend kesan bê hêş bixin. Ji ber ku kêfa wan lêdana me bû.

Me jî girtiyên qawûşê ev rewş dizanibûn, lê dîsa em lê dixebitîn ku kesên weha zû fêrî tirkî bikin da ku him ew him jî em ji lêdana wan zebeniyan xelas bibin. Lê em tu caran jî xelas nedibûn.

Kesên avêtin hundir û çûn. Piştî wan em li dor wî camêrî civiyan, me ew li gor îmkanên hebûn, bi av û nan kir. Piştî hilm (bêhn, nefes) a wî hate ber wî, li me mêze kir û bi kurdî got:

-Lawo van bê bavên ez ji qudûm xistim. Gelek tade û êşkence jî li min kirin. Lê bawer bin min ji wan fêr nedikir ku çî dibêjin.

Piştî hin pirsên me, û bersivên wî, me jê pirsî:

-Bira navê te bi xêr û tu ji bona çî anînî vir û êşkence bi te kirine. Wî got:



## Li girtîgeha Diyarbekirê hovîtiyên gardiyanan, li dijî azadîxwazan nahê jibîrkirin

-Navê min Elî û ji bajarokê Licê ji gundê.....me. Bawer bikin ez jî nizamim wan çîma ez anîme vir. Ez şivan bûm û li ber pezê xwe bûm. Ji xwe min ne Licê (Qezaya Diyarbekirê ye) û ne jî gundên cîran dîtine. Karê min tenê şivantî bû. Sibê heta razanê li ber pezê xwe bûn.

Rojekê piştî nîvro, dem dema ber bi êvarî bû, dîtina min dît, çend cemsên leşkeran li dora pezê min sekinîn, berê çekên xwe dane min û çend gotin bi tirkî gotin, lê min fêr nekir ku çî dibêjin.

Piştî hema yekî ji paşve xwe avêt ser min, ez û ew em li erdê ketin. Hema zû bi zû destê min kelemçe kirin. Çavên min girêdan û ez li cemsaxê xwe kirim anîm Diyarbekirê, û dest bi lêdana min kirin.

Ji ber ku min bi tirkî nizanî bû min pirsê wan ji min dikirin jî fêr nedikir û bê deng dimam. Ji ber vê bêdengiya min wan bêtir lêdan li min dikirin. Wan ez weke berpirsê rêxistînekê bi nav dikirin û her li min didan.

Ji ber nefêmkirina min ya ji pirsên wan, ez jî her bê deng bûm. Wan ev bêdengiya min weke ku ez naxwazim qise bikim, û pirsên wan bibersivînim, dizanî bûn. Aha mesela min jî ev e, û hê jî nizamim wan ez ji bona çî girtime, êşkenceyên nedîtî li min kirin û niha jî ez anim vir.

Belê, dûre em fêr bûn ku dema

leşkeran çar şoreşger dîtibûn û emrê girtina wan ji leşkerên li çiyê re çûbû, ew jî sê kesan digirin, lê yek xwe xelas dike, û nakeve destê wan zebeniye leşkeran tirk.

Ji bona hejmara xwe tamam bikin, ew jî şivanê reben, ku qet tirkî nedizanî, digirin û berpirsê xwe agahdar dikin ku wan her çar terorîst girtine.

Piştî Elî yê me ê ji Licê di nava me de hin tiştan fêr dibe û leşker ango zebeniye ber deriyê qawûşan jî fêr dibin ku bi rastî Elî tirkî nizane, heroj diketin qawûşa me, henek û tinazên xwe bi Elî dikirin û têra wî lê didan.

Her ku wan lêdan li Elî dikirin wî qet dengê xwe dernedixist, ji ber vê bêdengiya wî bêtir lê didan. Me nerî ku nabe, wê wî bikujin, me bang li Elî kir û jê re got: -Elî! van zebeniye ber deriyên qawûşan, hem leşker in û bêtirin wan nexwenda ne, ew bi lêdanê him aferîmê him jî çend rojan bêhnvedanê digirin.

Dema li te dan tu jî weke me bike hahoo, wecê xwe nexweş bike, bike qêrîn û hawar, dema wan jopek li te dan, heta ji te bê, bike gazî û hawar, da ku zû dev ji te berdin.

Wer hasil bi zor û zehmet me ev bi Elî da jiberkirinê. Çî dema leşkeran li me didan me dikir hawar û gazî, wan zû dev ji lêdanê berdidan. Lê dema hin li hember

lêdanên wan bêdeng bana, wan bêtir li wan didan.

Rojekê dîsa gardiyanê me û çend zebeniye li gel wî, ketin qawûşa me, çawa ketin hundir hema yek-ser bang kirin û got:

-Elî

Elî yê me ê bi tirkî nizanî bû û nikarîbû komûta xwe rast bide, gavekê ji nava me derket û got:

-Elî Licê Karagoz ka bêjin. Lê ev komûta wî bi serê xwe jî lêdan bûn. Ji ber ku tev şaş bû. Divê wî bigota: Elî Karagoz, emir bike komûtanê min”.

Bi komûta wî, hema çawişekî bi hêrs sîlek (Şemaqek) li Elî da, û Elî bi wê sîlê xwe avêt erdê û ranebû. Çawiş got:

-Elî rabe, ev ne tişteke, îro dora min û te ye.

Got, lê Elî ranebû, nerabûna wî bi xwe jî sîlê bû. Çend caran Çawiş bang li Elî kir ranebû, loma vê carê bi hîrîstir ji Elî re got: -Kurê Kerê, tu çîma ranabî? Eliyê li erdê dirêjkirî hema çavên xwe girt û got:

-Elî mir.

Piştî wan zebeniyan têra xwe li Elî dan û çûn. Me ji Elî re got: -Elî me ne got, weha bike. Me got tu jî bike hawar û qêrîn...

## Spasnameya Mamosta Hesên Şêweselî



**B**irêz û têkoşer mamosta Hesên Şêweselî di fayleke dengî de, derheq diyarîkirina roja 16'ê Sermawezê wekî roja kêmendamen PDKÎ spasnameyek belav kir ku di vir de deqa peyama rêzdarî em belav dikin.

Spasnameya mamosta Mela Hesên Şêweselî derheq diyarîkirina roja 16'ê Sermawezê wekî roja kêmendamen PDKÎ.

Xelkê bişeref ê Kurdistanê!

Kadr û pêşmergeyên têkoşer!

Kêmendamen cangorî û fedakar!

Endam û alîgir û dost û nasyarên hizbê!

Bi xatircemî ve hûn agehdar in ku Navenda Siyasî ya PDKÎ roja 16'ê Sermawezê wekî roja taybet bi kêmendamen PDKÎ bi awayekî fermî û bi eşkere mohr û diyarî kiriye.

Hûn bi giştî agehdar in ku roja 16'ê Sermawezê ya sala 1366'an, du mohreyên mekteba fêrkirî û sedî sedî cihê bawerîya dezgehên sîxorî ên rejîma Îranê bi navên Samed Kajeyî û Hesên Remezanî

pirtûkeke bombrêjkirî bi navê "Spîd dendan" ku wergerandiya wê bû "Dan Çermo" gehandin destên min, û di himbêza min de ew pirtûk teqiya.

Di encama vê teqînê de, ez wekî darekî şewitî ê nav daristanan ji reh û rîşe ve heta ser çiqilan pirtî pirtî bûm, û heliyam. Vê bûyerê mohreke wisa li ser eniya qedera min xist, ku heta dunya heye û jiyana min heye û di nav `alema axê de jî, dibe digel vê bêbextiyê li rex yektir bimînin, û dest bavêjin stûyê hevdu. Ragehandina vê bûyerê wekî roja kêmendamen PDKÎ ji aliyê PDKÎ ve, ne tenê li ber vê ku beşek ji şanazî û poana wê vedigere bo min, belku li ber girîngiya

Yekem: Ew daxuyaniya ji dîtingeha kirîza nasnameyî ve faktereke girîng û bandordar e, wê dema ku mirov dikevin bin barê giran ê eş û azaran û jiyana wan hildiweşe, rastî kirîza nasnameyî dibin. Têkçûn û tevliheviya nasnameyî, jîrbûna derheq biryardanê ji wan kesan distîne, û wê demê ew rastî bêasoyî û bêhêvîtiyê dibin, û destê wan naçe çî karekî, û çî karek ber wan naçe. Bi neçarî bêyê wê ku bixwe bizanin, dikevin ser pêla bûyeran, û di pêvajoya jiyane de, xwe nalivlîvînin, û

xwe dispêrin destên qeza û qedere. Ew ragehandin di ramalîna nasnameyê de, şûnwarekî wisa berçav ji xwe bi cih dihêle.

Duyem: ew ragehandina, di warê nûkirina pênaseyê de, girîngiyê yekcar zêde heye. Ya ku niha ez dibêjim renga wekî gotinên şetan be!?, lê aliyê kêmin jêve ye mirov di hinek rewşên bizehmet ên derûnî de, bixwe xwe winda dike, û nizane çî navekê li ser xwe danê, nizane mirov e, cimad e, nebat e yan jîndareke din e. Digel bawerîpênêkirin û girîngîpênêdana vir û wir berbirû dibe, û wisa lê tê, ku xwe di bazineya ehwal medeniya (kodika) tu aliyekî de nabîne. Di encamê de lerezokî û dudilî di nava gêjeweke derûnî de, wisa wî/wê pal dide ku nekare nuqteyeke hestpêkirî û kunkrê, bona lengergirtineke hekî kêmin jî be, ji xwe re diyarî bike. Wê ragehandin, ew hewayê saykolojî şikand, û nasnameyê nû, aliyê kêmin bo hejmarek mirovan nû kir, û wekî karta pênase ya cihê baweriyê bi mohrkirî danî xizmeta wan de.

Sêyem: Ragihandina han lewra girîng bû ku diwarê bédengiya li dora hin mijaran de herifand. Mêj dem bû ku taboya bédengiyê bi ser hizbê de zal bibû. Gelek lêw

devkut bibûn. Hesabnekirin, xem-sarî û bédengiya li ast kesên ku ji ber tîra bextreşîya rojgarê ketine, li wijdan û ferhengoka wan mirovên ku dostê mirovan in, hêla sor, helwestek namo û nerewa ye. Ragihandina Hizba Demokrat li dor kêmendaman, qîfla bédengiyê şikand û şifreyên daxistî pûç û vala kirin.

Çarem: Ragihandina Navenda Siyasî guhertin û xwederbaskirin ji sansorê pêre xuya dike. Piştî derketina ji Qendîlê, piştguhaxistin û vêdedan û baykot weke çandekê cih girtibû. Anku dikarim bibêjim metodek ji edebiyata erîstokiratîk tevî gotarên hizbê hatibûn kirin. Niha ku waneyek li edebiyata fermî ya hizbê de hatiye vekirin, nîşaneyê wê ye ku metodek nû ji guhertina çandî û kulturî pêk hatiye û pêvajoya geşekirina çandî di jordeçûnê de ye.

Pêncem: Daxuyaniya han bi awayekê rengê demokrasiyê pêve dixuye. Ez cewhera demokrasiyê li veğerandina kerameta mirovan bo mirovan de dibînim û nirxên bilinde demokrasiyê li "Ê'adêyê Hêsiyet" a mirovan de dixwînim û kakila rastîn a demokrasiyê li birêveçûna wekhevî û dadmendiyê de dibînim. Awrîdan ji hin xalên dîrokî ên jîbîrkirî, avedankirin û vejandina wan (heta eger biçûk jî bin) ez bi nîşane û remza yeksanîxwazî, bîrvekirî û avakirina usûl û pêgehên demokrasiyê dibînim. Ez awayek ji dîsîplîna nû, huner û geşekirina demokrasiyê di vê daxuyaniyê de dibînim.

Şeşem: Ez awayek ji berbirûbûna bi siyaseta hejarkujî û êrîşkirina ser sîstema heybetşikên û bêkes xendiqandinê di vê daxuyaniyê de dibînim. Ez di vê baweriyê de me ku eva destpêka vekirinek nû ye, afirandina derfet û seqayek nû ye bo wan kesên ku xwedî eşîret ninin, belê "qurbanan nabêjin", yên ku azad in û xwedî firaksiyon ninin û dixwazin heq ji ber wê ku heq e bînin ser ziman û dikarin zêdetir vegeşin û pitir huner û şiyarên xwe nîşan bidin.

Heftem: Vê daxuyaniyê girêhişkek mêjîn vekir. Bi salan bû ku meseleya kêmendaman basek wusa jê

**Nerîna Lîderan**



**Barzanî:**

“Em ji rewşa niha ya Rojavaya Kurdistanê nîgeran in”.



**Trump:**

“Em polîsê Rojhilata Navîn nînin”.



**Ehmed Turk:**

“Emê roja 31'ê Adarê bersiva qeyûman bidin”.



**Kaşanî:**

“Amerîkayê li Sûriyê de şikest xwar”.

**Hêza Pêşmerge, hewcehiya bizavê û waneyek ji bo xebatê**



**Elburz Roînten**

**Şer bikaranîna hêzê ye ji bo neçarkirina dujmin ji bo pejrandina îradeya me”**

**Rabêrtîl. Hiloy**

Ji bo her tevegerek rizgarîxwazî ku daxwaza mafê neteweyek bindest dîke û tevî bindestiya berdewam, gefa helandin û jî- navbirinê jî li ser e, bi taybetî ku ew tepeserkirina ji aliyê dewlet neteweyek dîktator û terorîst bihê peyrewkirin, hêz bi yek ji hewcehiyên girîng ji bo xebatkarên rizgarîxwaz tê zanîn.

Li ser têgeha hêz û awayên wê û herweha tîkilya wê bi siyasî re gelek bas û babet hene ku di hemû ew şîrove û analîzan de, hêz bi faktera sereke ya gihîştin bi armanca tê hejmarkirin.

Di sîstemên dîktatorî de ku bi hemû awayekê li dijî daxwaziyan neteweyan disekinin û seqayek teji tepeserî li nav civakê de diafirînin, hêza leşkerî ji bo berevanîkirin û bidestxistin û parêvaniya ji deskevtan û garantiya berdewamiya van deskevtan pîrbibandor e. Li vê dîtingehê ve rêberê nemir û aşîxwaz, Dr. Qasimlo li ser hêza çekê dibêje: “Tenê demokrasî dikare alternatîv hêzê ji boy me be”.

Ger em awirek kûr ji dîrokê û herweha rewşa niha ya deverê jî vedin, em dibînin ku hebûna vê hêzê çiqas hewce ye. Nemaze li Îraqa piştî Sedam Husên ku cehda cîbecîkirina piraktîk ya federalî û demokrasîyê tê dayîn, lê her rojê bi hincetekê li ser pîlana dewletên dîktatorî, êrîşa Kurdistanê tê dayîn ku berevaniya qehremanane ya hêza Pêşmerge, Kurdistan û deskevtan diparêzin.

Lewma hêz ji bo neteweya me ku xwedîbizavek rizgarîxwaz e, li vê deverê de hewcehiyek haşanekirî ye. Beşek ji vê hêzê ku di çarçoveya hêza çekdarî de hatiye rêkxistin, bi hêza pêşmerge tê nasîn ku navê wê jî berhema Komarê ye ji bo xizmetkirina Kurd û Kurdistanê.

Felsefeya avabûn û berdewamiya hêza Pêşmerge ku weke nirxek netewî ya civaka kurdî tê dîtin, xwe li canfîdayî, berevanîkirin û parastina Kurdistanê û serbestiya kurd de dibîne, lewma rêxistina vê hêza leşkerî di çarçoveyek demokratîk de ku ji bo mafên netewî dixebitin, wek Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê tevî çalakîyên leşkerî û rakirina çekê, bi yek ji hêzên herî rewşa û parêzerên aşîyê li dever û nemaze li cîhanê de ji bo bicîhatina nirxên mirovahiyê kiriye.

Her felsefeya han e ku wusa dîke pêşmerge li nav xelkê de xweşîvî be û tevî rewş û seqaya teji tepeserî û dijberiya dijwariya vê hêzê ji aliyê dîktatoran ve, bikare piştî dîrokek dirêj li şert û mercên cuda de serî rake û kar û çalakîyên wê bi heman felsefe û metodê ve berdewam bikin.

Çawa ku ew hêza leşkerî ya rewşa bi hewcehiya tevgera kurdî tê zanîn, li heman demê de piştevaniya vê hêzê ji aliyê gel ve, serkevtina pêşmerge ji bo bidestxistina daxwaziyan gel misoger dîke. Riya herî girîng û bîngehî ji bo wê ku gel bikare piştevaniya hêza pêşmerge da ku serkevtinê misoger bike, şorkirina felsefeya cangorîtiya pêşmerge û cewhera pêşmerge ye bo nav takên civakê de heya ku ji her takek civakê pêşmergeyekê biafirîne ku çekek cuda ji dest de be, lê di arasteya bidestxistina armancên pêşmerge ku xwast û daxwaziyan gel in, gavan bavêje. Wê demê hêza pêşmerge û çalakîyên cur bi cur ên gel di arasteya xebata netewî bo ji hole rakirina dîktator û anîna serbestiyê tewawkarê hevdu bin. Herwekî li stratejiya “Rasan”ê de hatiye ku hewil dide wê kar û tewawkarîyê bo serkevtina dawîn bi têçûyek kêmtir cîbecî bike.

Şorkirina felsefeya fîdakarî û kultura xebata pêşmerge bo nav civakê, ku çawa pêşmergeyek amade ye şert û mercên herî dijwar tehemul bike û canê xwe ji bext bike, takên civakê jî bi heman şêwe beşdariyê li bernamayan rewşa ên rêxistinê de bike, da ku dujmin li bihost bihostên xaka Kurdistanê de hest bi metirsîyê bike.

Li rewşek weha de ye ku Kurdistan ji bo dujmin dibe goristan û ji bo azadîxwazan jî dibe qada çalakî û xebatê. Hêza pêşmerge serbarê hewcehiya bi niha a şoreşê, dibe waneyek bo takên civakê heya bikare bi felsefeya pêşmerge ku fîdakarî ji bo gel û nîştiman e, li xwe de zeq û berceste bike.

## Vekişandina Hêzên Amerîkî Ji Sûriyê, Îxanetek E Li Kurdan û Derfetek E Ji Bo DAÎŞ



Rod Nordland

W ji NYTIMES: Hemîd Muxtarî

Rojekê piştî ragihandina vekişandina hêzên Amerîkî ji Sûriyê ji aliyê Trump serkomarê Amerîkayê ve, Dewleta Îslamî a Îraq û Şamê berpirsatiya teqînekê li Reqe, paytexta berê ya vê girûpê, girte stûyê xwe ku bû sedema kuştina şervanekî Kurd. Eva êrîşek biçûk ji aliyê Dewleta Îslamî a Iraq-Şamê ve peyamek bû ji bo Amerîkayê, û vê yekê derdixwe ku Ev girûpa dixawaze ji ew derfeta çêbûyî cardin mifaha xwe bistîne.

Vekişandina hêzên leşkerî yê Amerîkayê, ku roja Çarşemî 19.12.2018'an hat ragehandin, ji aliyê şarezayên siyasî ve bi wateya bi tenê hêştina Kurdan, hevpeymanên sereke yê Amerîkayê ye. Ev biryare herwiha derfetek e bo girûpa tundrew ya Îslamî naskirî bi Dewleta Îslamî a Îraq-Şam, ku hêj beşek ji başûrê rojava li Sûriyê li kontorla wan de ye. Girûpek ku hêj hezaran şerkerên wê hene.

Ev vekişandina herwiha çiraya kesk e ji bo Turkiyê da ku êrîş bike ser Kurdan li bakûrê rojhilatê Sûriyê, êrîşek ku bi egerek zaf wê bibe sedem, ku şervanên Kurd ji ew deverên ku ji dest DAÎŞ li başûrê rojava derxistine, paş vekîşin.

Rêberên hêzên demokratîk yê Kurdan li Sûriyê, xwe ji nîşandana her cure dijkiyarekê derheq biryara derçûna ji nişkêve yê hêzên Amerîkî diparêzin, û hêj li benda wergirtina zaniyariyên hûr û zêde ne. Lê Alan Hesen, rojnamevanê Kurd li Qamişlo dibêje ku Kurd bi rastî şok bûne. Jost Hiltirmen, rêveberê beşa



**Kurdan mêjve ye dest bi gotûbêjan ligel dewleta Sûriyê kiriye, û bi merca wergirtina otonomiyê yan rêveberiyê di herêmên xwe de, amade ne piştvenaiya dewleta Sûriyê bikin.**

Rojhilata Navîn ya ser bi centera Kirîza Navdewletî dibêje: Biryara Amerîka dikare bibe karesatek mezin bo Kurdan.

Di şerê li dijî DAÎŞ'ê de, Kurdan îsbat kir ku baştirîn hevpeymanên Amerîka ne, di nava salekê de, bi piştgirêdan bi hêzên Demokratîk yê Sûriyê û pêşmergeyên Kurd li Kurdistana Îraqê, Amerîka û hevpeymanên wê, karîna Dewleta Îslamî a Îraq-Şamê ji %99 ji herêmên bin kontorla wan de derxin.

Turkiye herdem dijî hebûna hêzên Kurdî li ser sînorê xwe bûye û wan weke terorîst dide nasandin. Hêzên Demokratîk yê Sûriyê, liqêke ser bi hêzên leşkerî yê Kurdan e bi navê Y.P.G, ku têkiliyên nêzik ligel PKK heye. Turkiyê wan her du girûpan weke yek grûp pênase dike.

Heyamek berê niha, hêzên Turkiyê êrîşê Kurdan li bakûrê rojhilat kir. Şerek ku du hevpeymanên Amerîkayê xistin beramber hevdu. Dewleta Amerîka tenê weke temaşavaneke di vê şerê de rol list û Kurd bi halê xwe tenê hişt. Niha

jî heman sînariyo di astek berfireh de dûbare dibe.

Roja Înê 14.12.2018, Receb Teyib Erdogan, serokê Turkiyê ragihand ku wê êrîşek din li dijî Kurdan li bakûrê rojhilat dest pê bike, herêmek ku hêzên Amerîkî hêj li wir cîgir in.

Ji bo Kurdan tenê derfet û bi-jardeya mayî Dîmeşq e. Kurdan mêjve ye dest bi gotûbêjan ligel dewleta Sûriyê kiriye, û bi merca wergirtina otonomiyê yan rêveberiyê di herêmên xwe de, amade ne piştvenaiya dewleta Sûriyê bikin.

Dewleta Sûriyê Kurdan weke sperek dijî hêzên Turkî li ser sînoran dibîne. Herwiha çend hêrêmên din jî ku xwedî petrol in û berê ji dest DAÎŞ'ê de bûn, nih ji dest Kurdan e.

Eger ew pirsên li serê hatin îşarekirin, ji bo Amerîka girîng nebin, bê şik dewleta Îslamî ji wan re girîng e. Girûpek ku hem li gorî hêzên demokratîk yê Sûriyê û hem şervanên Amerîkî hêj xwedî pêgeh û desthilat e

li Sûriyê, û şer dijî wê bi dawî nehatiye.

Dewleta Îslamî hêj çend herêmên biçûk li derdora bajarê Hajan li başûrê rojhilat û çend herêmên din kontrol dikin.

Heftiya derbazbûyî, berdevkekê ji hêzên hevpeyman yê Amerîka li dijî DAÎŞ'ê, bi navê "Col. Sean Ryan" texmîn kir ku hêj 2000-2500 şerkerên DAÎŞ'ê li herêma Hajan de ne. Şareza texmîn dikin ku dewleta Îslamî li Sûriyê û Îraqê hêj di navbera 20 heta 30 hezar şervanî heye, ku piraniya wan xwe veşartine.

"Maxwell B. Markusen" lêkoler li sentera Lêkolînên Navdewletî û Strategî li Washington e, dibêje ku gorî amaran her mehê 75 êrîşên terorîstî di nava axa Îraqê de ji aliyê Dewleta Îslamî a Îraq-Şamê ten encamdan. Gorî vê lêkolerê, Amerîka û Îraq lez ketin di ragihandina bidawîhatina şerê li dijî DAÎŞ'ê.

Heftiya derbazbûyî "Brett McGurk" nûnerê taybet yê Trump li dijî Dewleta Îslamî, di civînekê de ragihand ku hêj rêkek dirêj pêşiya me ye bo jinavbirina yekcarî ya DAÎŞ'ê.

Gorî ezmûnên me li heyamê çedîn salan, serkevtina dawî li dijî girûpek weke DAÎŞ'ê tenê bi rêya ji kontrolkirina herêmên bin desthilata wan de bi awayê fîzîkî bidest nahê. Dibe ev piştastbûna çêbe ku hêzên ewlehiyê li cihê xwe de ne, û dikarin ewlehiya xelkê û destkevtên bidesthatî biparêzin.




»»» Doma R:6

nedihat kirin, meseleyek daxistî bû. Helbet hin caran wekî rêzgirtin "Êsaletê ferd" li nav hizbê de dihat baskirin.

Zor car jî weke girêhişkekê maye û dev jê hatiye berdan. Daxuyaniya hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, ew hişkegirê vekir. Biryara han ji aliyê Navenda Siyasî ve bi fermî hat ragihandin. Ez xatircem im ku biryara han ji aliyê Lêpirsiyarê Giştî, Desteya Kargêrî û Dezgeha Çavdêrî û organên din ên berpirs ve jî hatiye erêkirin û dengê erê û baweriyê pê hatiye dayîn.

Tiştê ku xuya ye û ez jî pê kêfxweş û serbilind im, ev e ku beşeke kin ji vê biryarê, bandora min bûye û dikarim bêjim 99 jî sedî vê peyama rêzgirtin ji kêmendaman û xebatkarên navegere ser min û tenê min şanaziya ragihandina vê peyamê hebû ku weke resaletek li ser milên min bû ku bigihînim kêmendaman. Ji dil jî spasî û emegnasî û deyndariya xwe û malbata xwe digihînim rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û endam, alîgir û hevalan ku bi şandina gul, dil, "like", "comment" û peyaman ji bo heval û îradetmendê biçûk ê xwe, ez mezin û serbilind kirim û ji kûrahiya dilê xwe ve dibêjim ku hevî dikim weke hertim, bi wêrekî, îman, bawer û hêviyê, li



ser rêbaza xebat û tekoşînê berde-wam bin.

Saxî û tendirustiyê ji wan re dixwazim lê di rastî de ez xwe hêjayî van hemû lutf, mezinî, serbilindkirin û rêzgirtinê nabînim ku partiya me li hemberî min encam daye. Xwe jî biçûktir ji vê peyam û xelatê dibînim ku partiya me, daye min û pêşkêşî min û malbata min kiriye.

Lêbelê bi vîneke mezin, ez vê peyamê distînim û weke emanet, didim destên xurt ê pêşmergeyên di nav çeperên bixwîn de û bi destên qahîm û bi rêz û îhtiram, vê peyamê didanê ser serê xwe

û vedigerînim destê xurt ê xwedi-yê sereke ê vê û kêmendamen xebatkar û vê peyamê, pêşkêşî baregeha wan dikim. Di vir de dixwazim hin tiştên biçûk ji we ên birêz re vebêjim. Ez ne kêmendaman im belkî ez bêendam im. Çendîn salan berî teqînê, ez her kêmendaman bibûm. Şewîlka min a aliyê çepê şikestiyê, qewsa piyê min şikestiyê, ranê min şikestiyê, destê min di du ciyan de şikestibû û nivî felec bibûm. Gelek cihên din ên bedena min jî bi fişkekên dujmin birîndar bibûn ku wênayên curbicur ên birîndarbûna min jî di arşîva hizbê de hene.

Lê dîsa jî şanaziye dikim ku kêmendaman bim. Weke min berê

jî got, ji bo min şanaziyeke pir mezin e ku weke rasipartî, şanaziya gihandina peyam û resaletê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bidim kêmendaman. Di dawiyê de careke din spasiya rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û bi taybetî navenda siyasî dikim ku vê heyamê gelek westiyên û mijûlî ji wan re çê bû. Min guhdariya gotûbêja kek Hesen Şerefî û hevalên TISHK'ê jî kir û ji dil, spasiya hemû wan kesan dikim ku bi germî pêşwaziya vê mijarê kirin. Bejna xwe li hemberî hemû şehîdên me û bi taybetî şehîdên Rasana Rojhilat û ji bo civata berfireh a pepûkên xwînê ên bêtawan li deşta Koye jî ditewînim.

## Dîsan xwendegehek agirt girt û sê zarok bûne qurbanî

**D**i encama agirgirtina sobeyekê li Zahidanê, sê zarokan jiyana xwe ji dest da.

Piştî vê ku di xwendingeheke Zahidan a ser bi parêzgeha Sîstan û Belûçîstanê de, poleke xwendingehê, sobeya wê agir digre, û çend zarokan jiyana xwe ji dest da, parêzgar şîn û taziya giştî ragehand.

Destpêkê du ji wan dersxwanan jiyana xwe ji dest dabûn, û piştê dersxwaneke din bi sedema şevata servey %90 jiyana xwe ji dest dan.

Li gora raporê, di vê pola xwendinê de, sobeyeke nestandard hatiye bikaranîn. Tê gotin ku di dema bûyerê de, çar zarok di poleke xwendinê de asê mabûn, ku mixabin heya niha sê ji wan jiyana xwe ji dest dane.

Bêguman rejîma Îranê berpirsiyar e li hemberî wan hemû bûyerên dilêş û bijan ku di xwendingehan de rû didin û zarok di encamê de dibin qurbanî. Rejîma di ciyê vê de ku serwet û samana welat ku ya xelkê ye bo xelkê welat xerc bike, dibe bo welatên din û ji bo bîhaniyan xerc dike, û ron-dikên heram bo zarokên Felestînî û Yemenî û Lubnanaî dirêje.

Lê di hember de eva ye rewşa xwendingehên Îranê, ku her carê bi sedema nestandardbûna sobeyan û polên xwendinê ên kevn em şahidê bûyerên weha bûn.

Yek ji wna bûyerên herî bijan di xwendingeheke keçan a Şîrawê bû. Di bûyera xwendingeha keçan a gundê Şîrawê ya bajarê Pîranşar a girêdayî parêzgeha Urmîyê, ya ku di sala 1391`an de qewimîbû,



zêdeyî 29 keçên dersxwan ji sedî 25-75 rastî şevate hatibûn, ku du ji wan bi sebeba zêdebûna asta şevate jiyana xwe ji dest dan.

Li gora raporê, "Nadiya Salih" û "Mehnaz Mihemedpûr" ji wan keçên Şîrawê ne, ku tu demî nikarin bibin xwediye zarokan, û "Sîma Şadkam" jî, tevî ku 4 caran hatiye emelkirin lê, heyani niha jî êş û azarên wê dawî pê nehatine.

Herwisa "Amîne Rak" zêdetirîn asta şevate heye, û "Sîma Muradî" jî bi sebeba zorbûna asta şevate êş û azarê di hevka xwe de dibîne.

## Çend helbest li ser Ala Rengîn



**Besam Mistefa**

**A**la Rengîn di berhemên piraniya helbestvanên Rojavayê Kurdistanê de cihekî berçav girtiye  
Ala Rengîn di berhemên piraniya helbestvanên Rojavayê Kurdistanê de cihekî berçav girtiye  
Her gel û neteweyek li cîhanê xwedî aleke taybet û cuda ye ku wek nîşana serweriya wê neteweyê û sembola parastina azadî û serxwebûna wê tê hesabandin.  
Dewleta Kurdistan nebe jî, ala wan li gelek cihan bi fermî qedexe be

jî, lê ala Kurdistan bi rengên cuda û çirisanî û bi roja xwe ya zer di hiş û dilê Kurdistan de hertim li ba dibe û diteyise.

Ala Rengîn di berhemên piraniya helbestvanên Rojavayê Kurdistanê de cihekî berçav girtiye û qedir û qîmeteke herî bilind jê re hatiye terxankirin. Ronakbîr û helbestvanê mezin Osman Sebrî di helbesteke xwe de Ala Rengîn wiha wesf dike:

“Min divê her tu bilind bî. Ala rengîn kesk û zer. Him xweşî him ceng û rûmet. Tê zanîn ji sor û

gewr. Dûr, nêzik ezê te hildim. Tu yî xemla banê min. Ger bi vê derman mirin bî. Bo te gorî canê min! Dêrsim û Sasûn û Pijder. Bo te xwînê dirêjin. Herçî xort in, herçî Kurd in. Bo te lavjan dibêjin. Leşkerim bo te ala min. Min divê gurmîn û şer. Duwanzde mîlyon bûne pandî. Bo te Kurdên pir huner.”

Seydayê Cegerxwîn jî bi peyvên xwe yên şîrîn û nazik, di helbestekê de ala kurdan ya rengîn nemir dike û dibêje:

“Ala rengîn pîroz û xweş, te hildigrim diçim bi meş. Tu li ser milên xortên ciwan, di nav te de yek rojek geş. Ala sê reng î tu, bi nav û deng î tu, nîşana ceng î tu. Ey xortê kurdan silavê lê bikin. Îro me tu kirye himbêz, rojek wê bê te bikin rêz. Li ser bana, li eywana, roja şadî bi xeml û xêz. Kesk û sor û zer î, nîşana zafer î. Ey keçên kurdan silavê lê bikin.”

Romannivîs û helbestvanê Kurd Jan Dost jî bi helkefta roja ala kurdî bi rêya helbesteke kurt hest û hezkirina xwe ji ala rengîn re diyar dike û dibêje:

“Ev alaya me kurdan. Her Bilind e li ezman. Gelek naz û rengîn e. Kubar û pir şêrîn e. Kesk û sor e jêr û jor. Ji xwînê ye rengê sor. Kesk Buhara welat e. Pîroz dike ala te. Berfa spî li nêvî. Dil xweş dike bi hêvî. Wê roja zêrîn û zer. Şewqa xwe daye her der. Ev al e ji bil nîne. Kes heye nahebîne? Natewê wê her hebe. Wê tim ser serê me be.”

Helbestvanê Kurd ê mezin Mele Nûriyê Hesarî jî Ala Rengîn bi helbesteke xwe dipesînine û dibêje:

“Hey gul geşa serfiraz. Hey rohnîya şevreşa. Hey dîlbera pir niyaz hey xatûna dilxweşa. Hey hêvidara welat dermankera bê heşa. Bûka welatê mezin her cihê germ û qeşa. Gewr û sor, kesk û zer çar ji rengê te ne. Xweş tû ala minî Kurd li bendê te ne. Şabaş tû ala minî tiwî ser û sermiyan. Bo te em gorî dikin xwîn û guman û giyan. Binya te tev leşker in pirke tû kêf û hewat. Kurd va ji ter aniyê sed gewher û sed xelat.”

## “Xêro Abbas” strana Zemano ji nû ve kiriye klîp

**H**unermendê ji Rojavayê Kurdistanê Xêro Abbas strana Zemano ji nû ve stiriye û kiriye klîp.

Xêro Abbas ku xelkê Tirbesipiya Qamişlo ye strana xweya Zemano ji nû ve stiriye û jê re klîpek amade kiriye. Gotin a Mehmed Xelîl e, û Ronî Doxan jî muzika wê çêkiriye.

Derhêneriya klîpê Yasîr Elî kiriye û produserê stranê jî Hakan Akay e.

Di vî klîpê de Xêro Abbas ji zeman ne razî ye, û gilî û gazinek xwe pê dike û dibêje, ew ciwan bû, lê zeman ew pîr kir.

Xêro Abbas di sala 196 an de li Qamişloyê hatiye dinyayê. Li Rojavayê Kurdistanê perwerdehiya sereta, navîn û dibistana amadehiye qedand. Di sala 1986an de ji ber zextên hikûmeta Sûriyê û ji ber bê derfetiyan koçberî Almaniyayê bû. Di wan salan de eleqeya wî ser muzîkê zêdetir bû. Di sala 1998an de yekem albûma xwe ya bi navê “ Xerîbo ” belav kir.

Di 2002 an de di Newroza mezin ya Amedê ku bi qasê milyoneke Kurd tevî bû bû de derket li ser dîkê. Piştî gelek salan cara yekem bi vî navginiyê vegeriya axa Kurdistanê û di vî vegera xwe de maçî axa xwe kir û vî helwesta wî



ji aliyeke gel ve bi çoş û hez kiriyeke mezin hate pêşwazî kirin.

Xêro Abbas şeweya klasîk a muzîka kurdî bi bingeheke modern yekxistiye û bi vî avahî şeweyeke ku him girêdayî rêça xwe û heman demê de jî şeweyeke modern derxist holê.

## Zimanê Kurdî

- Wî alîkariya min kir.

Wê : Bo kesê nediyar ê yekjimara mêza ye.

Wek :

- Wê alîkariya te kir.

Wan : Bo kesên nediyar ên pirjimara her dû zayendan e

WeK :

- Min dû keç dîtîn, wan mazî diçinîn.

-Pêşiyên me nezan bûn, wan gelek derfet winda kirin.

Cînavên kesîn, yên koma (ez) di raweyên dema rast de bikar tên, lê yên koma (min) di raweyên verêse (tewangê) de bikar tên. Nimûne : 1- Raweyên rast (netewandî) : - Zîn çû dibistanê . - (Ew) çû dibistanê . - Şagirt veşeriyên malên xwe . - (Ew) veşeriyên malên xwe . - ..... 2- Raweyên verêse : - Zîne pênuşek kirrî (Wê) pênuşek kirrî - Şagirtan gurzek gul çînî (Wan) gurzek gul çînî Berçav e, ku di mînakên (1) ê de (Zîn, şagirt) di raweya rast de bikar hatine û cînavên (ew, ew) ji koma (ez) cihê wan girtiye. Lê di mînakên (2)ê de (Zîne, şagirtan) di raweyên verêse de hatine û cînavên wan jî (wê, wan) ji koma (min) bikar hatine. Ji van mînakên tê zanîn ku cînavên koma (min) şeweyê koma (ez) di raweya verêse de ne. Anku, cînavên koma (ez) di verêse de dibin şeweyê koma (min) :

Raweya rast	raweya verêse
- Ez dikim	- Min kiriye
- Tu dikî	- Te dikir
- Ew dike	- Wî, wê dikir
- Em ê bikin	- Me kiribû
- Hûn ê bikin	- We kiriye
- Ew dikin	- Wan dikir.

Cînavên koma (min) di rêxistina hevokan de, bi van şeweyên jêrîn bikar tên :

1-Bi karên derhingêv (têper) re :

Cînavên koma (min) bi karên derhingêv re dibin kara (kirar – fa'il) û dibin berkar (bireser – mef'ûl) ên rastder (dîrêkt) û yên nerastede (endîrêkt).

a-Kara:

Cînavên koma (min) di her çar raweyên dema bûrî tenê de dibin kara :

- Min name nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû.
- Te name nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû.

- Wî name nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû.
- Wê name nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû.
- Me name nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû.
- We name nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû.
- Wan name nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû.

b- Berkarên rasteder (dîrêkt) :

Cînavên koma (min), ji bilî dema bûrî, di hemû dem û raweyan de dibin berkarên rasteder. Ev cînavên berkar di navbera kar û karayê wî de tên .

Anku, li pey kara û berî kar cihê xwe, di hevokan de digrin.

Wek : - Dema nuho :

- Salar min dibîne, (te dibîne, wî dibîne, wê dibîne, me dibîne, we dibîne, wan dibîne).

- Dema paşeroj :

- Salar ê (dê) min bibîne, (te, bibîne, wî bibîne, wê bibîne, me bibîne, we bibîne, wan bibîne).

-Raweya fermanî :

- Min bibîne, min bibînin
- Wî bibîne, wî bibînin
- Wê bibîne, wê bibînin
- Me bibîne, me bibînin
- Wan bibîne, wan bibînin

- Raweyên daxwazî : - Xwezî, ez te serkevtî bibînim - Bila tu min bibîni - Eger hûn wê bibînin lêbûrinê jê bixwazin - Bi hevî me, ku ez we, wan bibînim .....

C- Berkarên nerasteder (endîrêkt) :

Cînavên koma (min), bi karên derhingêv re dibin berkarên nerasteder ku li pey wan karan bîn :

- Memo pênuşek dabû min
- Ez ê wê pênuşê bidim te

- Te ew pênuş neda wî - Memo pênuşek da wê jî - We pênuşa xwe neda me - Em ê pênuşan bidin we, wan Ev berkarên nerasteder li pey karên derhingêv, di hemû dem û raweyan de tên : - Zîne gulek daye min - Zîn gulekê dide te - Zîn ê (dê) gulekê bide wî, wê - Bila Zîn gulekê bide me jî ! - Gerek Zîn gulekê bide we, wan

**Dom heye...**

# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:  
◆ [www.Kurdistanmedia.com](http://www.Kurdistanmedia.com)  
◆ [www.Agirimedia.org](http://www.Agirimedia.org)  
◆ [rojnamaagiri@gmail.com](mailto:rojnamaagiri@gmail.com)  
◆ [www.facebook.com/Agirikirmanji](https://www.facebook.com/Agirikirmanji)

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: [Agiri2003@gmail.com](mailto:Agiri2003@gmail.com)

Hejmar (340)

## Merasima 26`ê Sermawezê li ser çiyayên Kurdistanê

